PEJRANDINA BAWERNAMEYÊN XWENDINA BILIND ÇAWA ÇÊDIBE?

Tu xwedan bawernameyeke zankoyî anku xwendina bilind î û tu dixwazî nuha li Almaniya kar bikî? Şansên te ji bo peydakirina kar wê baştir bin, eger tu Bawernameya xwe ya zankoyî bidî pejrandin. Hindek pîşeyên rêbazkirî hene, ji bo ku merov karibe di wan de kar bike, pejrandina Bawernameyên wan şertekî bingehîn e. Piştî ku merov wan Bawernameyan bide qebûl kirin, hingî merov dikare destûrnameyekê ji bo kar bigredest.

GOETHE INSTITUT

GELO DESTÛRNAMEYEKE MIN JI BO KAR HEYE?

NA → **DAXWAYNAMEYA KAR ARESTEY NAVENDA KARÛBARÊN JIDERVE Û PEYDAKIRINA KARKERÊN PISPOR, DEZGEHA FEDERAL JI BO KAR YAN DEZGEHA KARÛBARÊ BIYANIYAN**

Quick-Check • Têsteke lezgîn taku tu bizanî, ka tu dê karibî li Almaniya bijî û karbikî li ser malpera www.make-it-in-germany.com

Navenda elektronî ya bixêrhatinê ya ZAV • Şêwirdariya Online, Peywendî li ser malpera www.make-it-in-germany.com

Dezgeha karûbarê biyaniyan • wargeha herî nêzîk ji bo şêwirdariyê li herêma te li ser „Rêya min bo Almaniya" (Mein Weg nach Deutschland) www.goethe.de/mwnd

Dezgeha federal ji bo kar • Tu dikarî navnîşana wargeha herî nêzîk ji bo şêwirdariyê li herêma xwe li ser malpera www.arbeitsagentur.de peyda bikî

ERÊ

EZ DIZANIM KU PÎŞEYÊ MIN BERAMBER ÇI YE?

NA → **NASKIRINA PÎŞEYÊ BERAMBER**

Pejrandina li Almaniya • Ezmûna xwe bi xwe û şêwirdarî (bi rêya telefûnê jî/şexsî) li ser www.anerkennung-in-deutschland.de

Malpera Berufenet (Dezgeha kar) • Xizmetguzariyên agahiyan li ser malpera www.berufenet.arbeitsagentur.de

Pejrandin li Amaniya • Şêwirdariya online, bi rêya telefûnê yan rastexwe, peywendî li ser malpera www.anerkennung-in-deutschland.de

Make it in Germany • Online- yan şêwridariya bi rêya telefûnê li ser malpera www.make-it-in-germany.com

ERÊ

PÎŞEYÊ MIN YÊ BERAMBER A. RÊBAZKIRÎ YE B. NE RÊBAZKIRÎ YE?

A → **DOZA PPEJRANDINÊ**

LÎSTEYA ERÊNÎ

Li ser malpera www.arbeitsagentur.de/positivliste li vê lîsteya kar û pîşeyan binêre û wê baş bixwîne, ev lîsteya wan pîşeyan e, yên ku pêwîstiya Almaniya bi xebatkarên pispor hene. Eger pîşeyê te di vê lîsteyê de hebe, wî çaxî şansên te di bazara kar ya almanî de gelekî baş in. Lê divê tu hêdî bawernameya xwe ya zankoyî bidî pejrandin.

Doza pejrandinê herdem şexsî û ji hev cuda ye. Ev tê wê wateyê ku ji bo dozên curbecur qanunen û karmendên curbecur hene. Li gorî zehmetiya dozê, encamdana dozê dikare heta sê heyvan dewam bike û mesrefa wê jî ji 100 heta 600 € ye.

Agahdariyên berferhtir li ser malpera www.anerkennung-in-deutschland.de hene.

KÎJAN DEZGEH BERPIRSÊ PEJRANDINA PÎŞEYÊ MIN E?

Tu dikarî bi rêya peydakirina pejrandinê (Anerkennungs-Finder) anerkennung-in-deutschland.de nas bikî, ka kîjan dezgeh berpirsê Doza pejrandina bawernameyên te ye û ka pêwîstiya te bi kîjan belgenameyan heye.

WERGERANDIN Û MOHRKIRINA FERMÎ YA BELGENAMEYAN

Xwe agahdar bike, ka kîjan belge û bawernameyên te mecbûr werin wergerandin û mohirkirin. Behra bihtir bawernameyên kar û qedandina xwendinê ne.

Navnîşanên wergerên qanunî û ji aliyê dewletê ve pesendkirî li ser vê malperê peyda dibin: www.justiz-dolmetscher.de û herweha li ba dezgeha federal ji bo kar (Bundesagentur für Arbeit).

DAXWAZNAMEYA TESBÎTKIRINA WEKHEVIYÊ

PIŞTEVANIYA DIRAVÎ JI BO DOZA PEJRANDINÊ (ANERKENNUNGSZUSCHUSS)

Tu dikarî daxwaza piştevaniya diravî ji bo mesrefa doza pejrandina bawernameyên xwe bikî. Tu dikarî agahdariyên berferehtir û hemî pirsnameyên pêwîst li ser vê malperê peyda bik bine www.anerkennungszuschuss.de.

PIŞTEVANIYA DIRAVÎ JI BO MOHIRKIRINA BELGEYAN

Derbarê vê mijarê ji dezgeha federal ji bo kar (Bundesagentur für Arbeit) bipirse.

B

DOZA PEJRANDINÊ YA XWEBEXŞ

Ev şêwe şansên te li bazara kar ya almanî û derfertên te ji bo bêrdewamkirina xwendinê û herweha pereyên te yan dahatê te pirtir û baştir dikin.

ERÊNÎ

Pejrandina sed ji sedî: Zaniyariyên te yên biyanî beramberî pîşeyê almanî ne.

ERÊNIYEKE PARÇEYÎ

Wekheviya parçeyî: Pîşeyê te yê biyanî di hindek xalan de beramberî pîşeyê almanî e, lê di hindek xalan de jî cudahî hene.

Di biriyarnameyê de tê nivîsandin, ka kîjan beş ji xwendina te hatine qebûl kirin û kîja beş hîn kêm in û divê tu wan bixwînî û ji bo vê yekê tevlî kursan bibî. Eger te biriyarnameyeke wisa wergirt peywendiyê bi wargeha şêwirdariyê re deyne û xwe li ser vê mijarê agahdar bike.

NEYNÎ

Bi tû şêweyekî wekhevî nîn e: Merov nikare pîşeyê te yê biyanî û pîşeyê almanî bide ber hevûdin. Daxwaznameya te hate redkirin.

Agahdariyên berferhtir derbarê derfertên te, tu dikarî di rêya tevna IQ (Netzwerk IQ) peyda bikî (www.netzwerk-iq.de).

TU DIKARÎ XWE JI BO KAR PÊŞKÊŞBIKÎ!

Lê Hûn nuha dikarîn li Almaniya ji xwe re li karekî bigerî û heger te karek ji xwe re dît, tu dikarî dest bi kar bikî. Tu dikarî agahdariyên derbarê vê mijarê wek mînak li ba dezgeha federal ji bo kar (Bundesagentur für Arbeit) peyda bikî. Ji kerema xwe re hayadar be, ku merov mecbûr e ji bo ku karibe di hindek beşan de yan pîşeyan de kar bike, divê ezmûna pîşe û ezmûna zimanê pîşeyî encam bide.

ZANEBÛNA BI ZIMANÊ ALMANÎ

Heger merov zanibe baş bi zimanê almanî biaxive, wê derfertên baştir ji bo merov vebin. Behra bihtir divê merov bi kêmanî pileya B1 standibe. Tu dikarî kursên zimanê almanî li welatê xwe li ser vê malperê peyda bikî: www.goethe.de

Europa fördert
Asyl-, Migrations-, Integrationsfonds

Ev proje bi hevkarî tê fînansekirin ji aliyê fonda penaberiyê, koçberiyê û hevguncînê